

sibe zû ye, ev çî mixiltiye ? guhdariya wan dike; lê deng lê rast nabin. Di qulika derî re dinêre, dibîne cêbek rawestiye, du kesan xwediyê mala cîrên weke guran miyekê bi nav xwe din û rakêşkî hindirê cêbê dikirin.

Weke cîranê xwe nas dike, mat dimîne ! nizane sûcê wî çî ye. Bê ku pê birame li nivîna xwe vedigere.

Ji ber karê mal nikaribû, ji nuh ve di xew keta. Deng li keça xwe kir sifre jê re amade kiribû, wê ew mal tev xwedî dikir, ji ber ku ciyê xwe di mal de girtibû. Piştî çû kar, ew jî diçû firnê û vedigerî.

Wê rojê ew mîn a jinek nebîranî dilê xwe pir goşt dixwest, lê gava li berîkê vedigerî, ew daxwaz ji ber bihabûnê dihate qurçandin, tevî wê ew pêl di binê derûna wê de li hev diket. Li nîzîkî malê firoşgehek mirîşkan hebû, perên berîka xwe dijmêrtin têra celfînekî der ne diketin, nizanî dê çawa bike. Li kêleka mal mêze dikir, ku dusê pisîk weke piling li laşakî dihatin hev û diçirandin, weha ji tûrekî reş didirandin, ew bervê diçû; wan dev qîç dikirin gir girî bi xwe dixistin tê de çav beq dikirin, wê serên mirîşkan tê de didîtin, pisîkek reş jê re digot: Tûrik ji ber me merevîne, ez pêrîme, bi şev dixew de ezê te bifetisînim. Lê hurçê birçîbûnê bihna goşt di dil de dengê pisîka reş nekir. Bi lez bêyî ku kes tûrik dest de bibîne, dikete hewşê û der li pê xwe digirt. Turik diçirand, têde serî nig tev hev bûn. Di dilê xwe de digot: Ma çî pêve heye, ezê bikelînim goşt ji hestiyar bikim, di ber gêrmîyê re ji zarokan re bi şîvkim. Ma kî zane ?

Li ser şîva kutkê malê digel qîçikên xwe li dor sifrê kom dibûn. Bi coş xwerin dixwerin, diya zarokan bê hemdî xwe dixwer, zik li xwe dikir bêder; bi kevçiyê dawî re tiştêkî tûj weke şefrê bi gewriyê xuşî, êşa wê hindir teqle donderî dikir û dişewitî. Ax ûx ...kuxik li ser hev dihatê, hema hema dêku bifetisya, hevki diçû êş

pir dibû, nikarî gotirkira.

Zarokên xwe dişandin ba cîranan, lê kom dibûn, hêl hûl ji malê hildikeli. Her yekî gotinek dikir. Li dawê radikirin nexweşxanê. Bi rê ve teksî ji kortekê der diket di ya din wer dibû.

Piştî diktoran ew sedikirin û biyar weha dabûn: Boriya gewriyê yê xwerinê ji jor de heya jêr çiriye, zik tijî xûn bûye, divê bilez emelet jê re were kirin, ger weha bimîne wê bimire, kî xwediyê xwe ne ?. Cîran dibêjin: Ev keça xwe ye.

Diktor dibêje: ka bavê te, mervên te ?

Keçik: Bavê min miriye, kesî me tu ne ye! Tu zanî diktor

Diktor ustiyê xwe badide, bê deng diçe oda qlemteraşê. Ên pispor li dorê kom dibin, jê re emeletê dikin. Vê carê şiyar nabe, dikin nakin xewa bencê girane şiyar nabe, wê hîngê diktorê bencê lê haybû ku pir dayê ye. Katek didu çar... yawaş yawaş lédana dil kêmbibe.

Wê gavê diktorê bencê der dikeve der ve, keçik û cîranan dibezin pêşiyê. Çawa bû, bi serî bû...?

Diktor dibêje: Wîn zanin çima gewriya wê çiriye ? Ji zik dirnaqek nigên mirîşkan bi der ketiye, ew sedeme. Ma ev pisîk bû nigên mirîşkan xweriye; êsta ewê di xew de ye. Yek jê dipirse: Dê kînga şiyar bibe.

Diktor: We çî lez kiriye, qey heya roja qîymetê şiyar dibê, wê hîngê ademizyad wê tev ji xew rabin.

Heya diktorê bencê vedigere oda qlemteraşê, dilê wê xwe ji hemî êş qisawetan xwe vehesandiye. Bi sibê re termê ji nexweşxanê bi der dikeve, digel pasekê û çend salonan, ji korta Şêx Meqsod xerbî, û ji hêlîna, li ser zarokên xwe difire goristana Henên.

Li ser mala wê ya sermed, dost, cîran û hezkirinê wê, bi dil in çelmisî û çav in şil kom bûne. Xoce bangê dike:

Hey Henîfe keça diya xwe, guhdarî min bike û li pê min bibêje: ...

Şênî li goristanê vedigere, wê ji roja nûjenê re dihêlin. Lê hê di qisaweta zarokên xwe bû. Ji ber ku zarok ji roj in na nas re ma bûn.

Wê destê xwe ji tirbê bi derxist û bi kevirekî reş û xêzeke qaling li ser kêlika li ber xwe nivîsand:

**Pakrewana serpiyan**  
HEYFA MIN JI MIRÎŞKAN VEDIN  
30-04-2010